

**Ji bo dêûbavên, zarokên
wan diçin kreşên Berlinê**

01.04.2021

Jinûvegirtina hêlînên zarokan ên danê rojê û saziyên lînêrîna zarokan a danê rojê

Agahiyên ji bo dêûbavan ên li ser xebata acîl a piştî 8ê Nîsana 2021an

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

ji ber bûyerên enfeksiyonê yên her bêhtir dibin, ku di nav wan de cûreya vîrusa koronayê (B.1.1.7) her xurttir dibe, Senatoya Berlinê di civîna xwe ya taybet a îro de biryar stand, ku hêlîn û saziyên lînêrîna zarokan a danê rojê ji nû ve werin girtin û her wisa dîsa li xebata acîl were vegehrîn. Ev rêbaz piştî 08.04.2021an derbas dibe. Bi vî awayî divê hejmara enfeksiyonên nû were kêmkirin û pêşî lê were girtin, ku pergala tenduristiyê nekeve bin bareke giran.

Mirov dikare ji lînêrîna acîl hingê sûdê bigire, gava

- pêdiviyêke awarte û acîl a lînêrîna zarokan hebe û derfeteke din a lînêrîna tune be

û di heman demê de

- karê pîşeyî yê yek ji dayik û bavî (her wisa di Homeoffice'ê de) di lîsteya nû ya ji bo lînêrîna acîl a hêlîna zarokan de nivîsandî be. Ev lîste li ser vê derê xuya dibe <https://www.berlin.de/sen/bjf/corona/schule/uebersicht-der-berufsgruppen-fuer-die-notbetreuung.pdf>

- zarok herin pêsdibistanê (ango zarokên, ku havînê dê derbasî dibistanê bibin) yan jî ev zarok, zarokên dayik an jî bavên tenê bin, bêyî ku karê pîşeyî yê van dêûbavan ango berpirsyarên qanûnî li ber çavan were girtin, an jî
- lênêrîna van zarokan ji ber sedemên pedagojîk ên taybet û acîl pêwîst be. Di vê çarçoweyê de zarokên di astengiyê de ango zarokên bi astengî, zarokên pêdiviya wan bi piştgiriya zimanî heye û her wisa bûyerên parastina zarokan cî digirin. Her wisa bêyî ku karê pîşeyî yê dêûbav ango berpirsyarên qanûnî yên van zarokan li ber çavan were girtin, ev zarok ji mafê lînêrînê sûdê digirin.

Sedema pêdiviyeye awarte û acîl a lînêrîna zarokan dikare ji ber kar an jî şexsî be. Dibe ku ev yek pêdiviyeye tenê ji bo rojekê be yan jî pêdiviyeye berdewamî yan jî bi rêkûpêk be.

Dîsa jî em ji tevahiya van dêûbav ango berpirsyarên qanûnî dixwazin, ku zarokên wan xwedî mafê lînêrînê ne, di mijara pêdiviya lînêrînê ya şexsî de tenê bi qasî ku teqez pêwîst e, ewqas sûdê ji vî mafî bigirin û bi rêkûpêkî li gel navendên hêlînên xwe biaxivin.

Ji kerema xwe re bila di bîra we de be, ku zarokên xwedî nîşaneyên sivik ên nexweşiyê jî, wekî zekemîketin an jî kuxînê, niha bêyî encameke negatîv a testê nikarin sûdê ji lînêrînê bigirin. Rêbazên di derbarê nêzîkatiya bi zarokên xwedî nîşaneyên nexweşiyê de, ku di nivîsa ji 31.03.2021an a agahiya dêûbavan de diyarkirî ne, hêj jî bi berdewamî derbas dibin.

Mesrefên xwarin û vexwarinê:

Ji ber ku xebata acîl a lînêrînê careke din pêk tê û bi vê yekê re jî ji dêûbavan re ji ber vê sedemê astengî derdikevin û zehmetiyên wan çêdibin, me ji saziyên hêlînan rica kir, ku piştî meha Nîsanê, gava zarok di mehekê de bêhtirî 10 rojan ji xizmeta lînêrînê sûdê negirin, hingê heqê mesrefa xwarin û vexwarinê ji dêûbavên wan nestînin. Ji ber ku heqê mesrefa xwarin û vexwarinê serê mehê tê standin û di vê demê de bi zelalî ne diyar e, ka zarok dê ji xizmeta lînêrînê çiqas sûdê bigirin û wekî din her wisa nayê zanîn ka pêkan e, ku hesab paşê were kirin.

Dêûbavên hêja,

Senatoya Berlinê li ser dixebite, bi qasî ku pêkan e, zû vegere xebata asayî ya astengkirî ya li gorî şertên pandemiyê. Ji bo vê yekê em kampanyaya derziyan a ji bo xebatkarên hêlîn û saziyên lînêrîna zarokan a danê rojê didomînin. Wekî din di hefteyên pêş de ji bo xebatkarên pedagojîyê û her wisa zarokan bêhtir Testkit dê werin amadekirin. Wekî din, tevgerîna li gorî pîvanên paqijiyê bi qasî demên berê, niha jî bingeheke girîng e.

Em ji bo xweşbînî û piştgiriya we spasîya we dikin.

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk